



K.T.

Zanîngeha Mardîn Artûklûyê

Enstîtuya Zimanên Zindî yên Li Tirkiyeyê

Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez

Dengbêjî û Dengbêj Hesoyê Şûxê

Dilek BİLEN

15721100

Şêwirmend

Doç. Alk. Dr. Necat KESKİN

Mardin 2018

K.T.

Zanîngeha Mardîn Artûklûyê

Enstîtuya Zimanên Zindî yên Li Tirkîyeyê

Şaxa Makezanîsta Ziman û Çanda Kurdî

Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez

Dengbêjî û Dengbêj Hesoyê Şûxê

Dilek BİLEN

15721100

Şêwirmend

Doç. Alk. Dr. Necat KESKİN

Mardin 2018

NAVEROK

KURTE	ii
ÖZET	iii
PÊŞGOTIN	iv
DESTPÊK	1
1.Mijara Xebatê û Sînorên Xebatê	1
2.Armanç û Girîngiya Xebatê	1
3.Rê û Rêbazên Xebatê	2
4.Pirsgirêkên Xebatê	2
BEŞA YEKEM	
DENBÊJ Ê DENG BÊJÎTÎ	3
1.1. DENG BÊJÎ	3
1.2. MIJARÊ KILAMÊN DENG BÊJAN	6
1.3. DENG BÊJÎ DI SERDEMA OTONOMÎ Ê MODERN DE	10
1.3.1. MALA DENG BÊJAN	11
1.4. DI ÇANDA DENBÊJÎYÊ DE ROLA JINAN	12
BEŞA DUYEM	
DENG BÊJ HESoyÊ ŞÛXÎ	14
2.1. GUNDÊ ŞÛXÊ	14
2.2. KURTE JIYANA DENG BÊJ HESoyÊ ŞÛXÊ	15
2.3. DU MÎNAK JI KILAMÊN DENG BÊJ HESoyÊ ŞÛXÊ	16
2.3.1. Şerê Miheme Elî Ê Hesenê Bira	17
2.3.2. Kilama Xazî	20
ENCAM	23
ÇAVKANÎ	24
PÊVEK	25

KURTE

Di çand û hunera kurdan de dengbêj, dengbêjî cihekî giring digire. Lewra dengbêj, fîlozofê dengê ye. Bi kilamên xwe di nav Kurdan de “bîreke hevpar” pêk aniye. Mîna gelên yê ji berê ve xwedê çanda devkêyekî dewlemend, gelê Kurdan jî xwedê çanda devkiyekî dewlemend e. Veguhêzerê vê çandê yê sereke jî bêguman dengbêj e.

Kurd xwedê çandê dewlemen in. Lê ji bi qasî dewlemendiya dengbêjan gelek dengbêj nayîn naskirin. Sedemên vî yekî cur bi cur in: Siyasî, tinebûna folklorzanan û amûrên teknolojiyê... Dengbêj Heso jî yek ji van e. Ev dengbêj bi kilamên xwe *bîra Kurdan ya hevpar* û *ji dîroka xwe agahdar bûn zîndî girtiye*. Lê mixabin ku xeynî herêma xwe gelek nayî nasîn. Bi vê lêkolînê armanca min ev e ku vî dengbêjê hêja û herêma wî bi lêkolîneke akademîk, bidim naskirin.

Ji bo vê lêkolînê bi malbat û heyranên dengbêj re hevpeyvîn hatkirin. Teknîkê berhevkirina vê lêkolînê; hevpeyvînên rû bi rû, qeyda dangan, kêşana video û wêneyan e.

Peyvên Sereke: Dengbêj, Kurd, dengbêj Heso, Çand, Folklor, Bîra Hevpar, Veguhêzer

ÖZET

Kürt halk kültüründe ve yaşayışında ozan, şair diye kabataslak nitelendirebileceğimiz dengbêjler ve onların icraa ettiği dengbêjlik sanatı çok ayrı bir öneme sahiptir. Dengbêj, deng yani ses; bêj yani söylemek, kelimelerinden meydana gelmektedir. Esas anlam itibariyle dengbêjlere “ Söz filozofu, kültür aktarıcısı, kuşaklar arası bağlantı kuran, doğuştan ozan...” gibi derin anlamlar yüklemek mümkündür. Tarihin bilinmeyen zamanlarından bu yana gelen zengin sözlü kültüre sahip toplumlar gibi Kürt toplumunda da kültür taşıyıcılığı ve ortak bir hafıza meydana getirme önemli bir misyondur. Bu misyonu Kürt kültüründe dengbêjler üstlenmiştir.

Zengin bir dengbêjlik sanatına sahip olan Kürtler gerek siyasi sebeplerden olsun gerekse teknolojik yetersizliklerden ve folklor araştırma eksikliklerinden olsun birçok dengbêji tanıma fırsatı bulamamıştır. Bu araştırmaya konu olan “dengbêj Heso” bunlardan bir tanesidir. Usta-çırak anlayışıyla yetişen bu dengbêj, bulunduğu yörede Kürt tarihinin ve kültürünün bir anlatıcısı aynı zamanda güzel sesiyle bir ozanı olmuştur. Bu çalışmayla, bulunduğu yörenin “ortak hafızası”na katkıda bulunan ve yaşadığı *Botan* yöresi hariç pek tanınma imkanı bulamamış dengbêj Heso ve onun doğup büyüdüğü yöre akademik bir çalışmaya konu olmuştur.

Dengbêj hakkında araştırma yapılırken ailesi ve hayranlarıyla görüşme yapılmıştır. Mülakat, röportaj, ses kaydı, video ve fotoğraf çekimi gibi görsel materyaller kullanma teknikleri kullanılmıştır.

Anahtar Kelimeler: Dengbêj, Ozan, Kürt, Dengbêj Heso, Kültür, Folklor, Ortak Hafıza, Aktarıcı

PÊŞGOTIN

Ev xebat li navenda Sêrtê, Berwariya û Şûxa hat kirin. Lêzim û heyranên dengbêj Heso li van deran e. Dengbêj Heso li herêma ji nifşê kevin ango bav û kalan ve gelek tê hez kirin. Heyranên dengbêj di qesetan de dengê wî qeyd kirine û car caran guhdar dikin. Lê mixabin ev dengbêj ji bilî herêma xwe di nav Kurdan de wek dengbêjên navdar nayê nasîn. Bi vê xebatê mebest ev e ku hunermendekê Kurdan din jî bi jiyana xwe bê naskirin. Giringiya dengbêjan di nav çand û hunera Kurdan de çi ye ? Ev bê dîtîn. Disa cihê *dengbêjên jin* di vê warê de çi astê de ye ? ev hat berhevkirin.

Di serdama modern de hunera dengbêjiyê çawa tê icra kirin? Ji bo bersiva vê mijarê jî lêkolîn hat kirin.

Ji bo jiyana mirovekê baş bê zanîn pewist e ku cihê ji dayikbûna mirov û welatê wî jî bê zanîn. Lewra di vê lêkolînê de me jî cih da gundê dengbêj Heso. Gundê dengbêj ji aliyê cir bi cur ve hat danasîn. Keseên ku ji malbata Heso yê hat dîtîn li wan re hevpeyvîn hat kirin. Dîsa li heyranên wî re jî me hevpeyvîn pêk anî. Kilamên dengbêj yê me bidestxistî ê hat tomar kirin. Ji van du minak di vê lêkolînê de cih girt. Kilamên dengbêj bi devoka wî; devoka Botî hat nivîsîn. Her çiqas dengbêj ji herêma min be jî ji ber cudahî bûna gundê me û kêmasiyên min li dema guhdarkirina kilamên dengbêjê, ji bo ez wan binivîsim min ji neviyên dengbêj Abdulmanaf Oğuz û wekî yekê heyrana dengbêjê ji bavê xwe Ahmet Bilen sûd wergirt. Kunyeya van di pêvekê de heye.

DESTPÊK

1. Mijara Xebatê û Sînorên Xebatê

Dengbêj Heso dengbêjekê herêma Botan e. Dengbêj ji gundê Şûxa ye. ev gund jî girîdayiyê li Berwari yê; Berwarî(Xesxêr) jî navçeya Sêrtê ye. Bi giştî li vê herêmê tê nasîn.

Ev xebat li Şûxa, Berwarî û navenda Sêrtê hat kirin. Ji xeynê neviyên dengbêj di gundê wî de ji malbata kes tine bû. Birayê wî li Duhokê jiyana xwe xilas kiriye. Xwaha wî li navenda Sêrtê dijî. Keç û kurên wî yê sax bajarên rojavayê Tirkiyeyê dijîn.

Di vê lêkolînê de dê *dengbêj Heso*, *jiyan û kilamên wî* bê danasîn û bi wî re *giringiya dengbêjan di civak, jiyana, çand û hunera Kurdan* de bê vekolîn.

2. Armanç û Girîngiya Xebatê

Ji ber sedemên dîrokî, çandî û stîla jiyanê di nav Kurdan de bêtir wêjeya devkî pêşve çûye. Dengbêjî jî hêmanekê wêjeya devkî ye. Di nav gel de ev huner mezin bûye û cihekê taybet di çand û hunera Kurdan de ji xwe re cih girtiye. Hunerekê dewlemend jî be ji ber faktorên siyasî û bêderfetiya teknolojiyê gelek dengbêjên Kurd ên dijîn an jî koça dawî kirinê nayîn nasîn. Di herêma Botan de dengbêjekê wiha heye: dengbêj Heso... Min vî dengbêjê bi saya bavê xwe naskir. Wekê bavê min mezinên me heyranê dengbêj Heso bûn. Ji dengê wî pir hez dikirin. Buyerên dengbêj di kilamên xwe de distiriya bala gel kişandiye. Lewra li van deran di pêşiya salên dawî de ne televizyon ne kompûter ne medyaya civakê hebû. Redyo jî kêmbû. Bi kilam û cîrokên dengbêj mirovan demên xwe borandine û heya wan jî serpêhatiyên çêbûye.

Tekariyê dengbêjan li ser civak, çand û hunera Kurdan çiyê? Bi vê xebatê bersiva vê pirsê hat dayîn ku dengbêjî ji bo Kurdan mijarekê giring û bêsînor e lê beravajî vê xebat nehatiye kirin.

Bandora dengbêj Heso hêj di vê herêmê de didome. Armanca me ev bû ku em wî ji aliyên cur bi cur bidene nasîn û nehilîn nifşên nû wî ji bîr bikin

3. Rê û Rêbazên Xebatê

Beriya lêkolîner destpê xebatê nekiriye pêwîste ku ji xwe re azîne û rêçekê diyar bike. Dema ev lêkolîn hat kirin di derheqê dengbêj û hunera dengbêjiyê çend xebatên nivîskî sûd hat wergirtin.

Kesên ku me ji wan re hevpeyvîn pêk aniyên re bi giştî ev pirs hatin kirin û bersiva wan hat tomar kirin :

Dengbêj kî ye?

Li ber destên kîjan hosteyan rabûye? Perwerdehiya xwe çawa dîtiye?

Dengbêj kilamên xwe bienstrûman dibêje an bêenstrûman?

Çîrok û serpihatiya helbestên wî çine?

Ji aliyê aborî ve dengbêj ji yana xwe çawa didomîne? (Yıldırım, Pertev û Aslan, 2013: 154)

4. Pirsgirêkên Xebatê

Dema ev xebat hat kirin pirsgirêka xebatê ya herê mezin tinebûna dengbêj ya li vê dinyayê de bû. Lewra agahiyên jiyana û gundê dengbêj ji devê xwaha, nevî û heyranên wî hat tomar kirin. Di vê warê de neviyê dengbêj Ebdilmenaf gelek alîkarî da. Yekê din a pirsgirêka xebatê ew bû ku ji vê nifşa nû ya gelî herêmên yê dengbêj nas bikin kêma bûn. Ji nifşên kevin û bi mirovên kêma henê re hevpeyvîn hat kirin.

Ji malbata dengbêj xwaha û neviyên wî li vê herêmê bû. Yê din bajarên rojavaya Tirkiyeyê dijîn. Ji ber bêderfetbûnê li wan re hevpeyvîn pêk nehat. Dema min xwaha dengbêjê Naîme re hevpeyvîn pêk aniyê wê di serê de nexwest bi min re hevpeyvîn pêk bîne. Piştê ricayan pijirand. Ji bo ku miroveke olperest bû dîsa nexwest ku ez dengbê wê tomar bikim û wêneyn wê bikişînim. Di derheqê dengbêj tu keresteyên nivîskirî nehat dîtin. Ev rewş jî ji bo xebatê pirsgirêkê mezin bû.

BEŞA YEKEM

DENGBÊJ Û DENGBÊJÎTÎ

1.1. DENGBÊJ(Î)

Beriya pênasê dema em têgîna dengbêjê dinêrin dibînin ku ji peyva *deng* û *bêje*'yê pêk tê. Ev jî tê wateya xweşikkirina gotinê. Dengbêj ew kese ku bi hunera xwe ya taybetî kilaman û çîrokên gelêrê di cihên wek dîwanxane, zozan, mîhrican û dawetan de vedibêje, distire. Dibistanên dengbêjiyê nîne. Lê hostayên dengbêjan hene ku dengbêj, li ba hostayê xwe perwerdehiya dengbêjiyê dibine. Bi pêwendiya hosta-şagirt dengbêj dikemile û tê asta hosteyê.

“Dengbêj ew kes e ku teşe dide dengê. yanî hostayek e ku karê wî deng e. Dengbêj deng dixê awayê klam û muzîkê.” (Uzun, 2008: 11)

"Derbarê dengbêj û dengbêjiyê de ferhenga me bi belaxatê tije ye. Dema ev peyv tînan ser ziman, gotinên wek 'lehengê çandê qadîm', 'avakarê hişekî civakî', 'hosteyê peyvê', hêza kelamê', 'dengê çanda bav û kalan' li pey hev rêz dibin..."(Alan, 2015: 9)

“Wateya kilamê axaftin, tekellüm kirin an jî derbirin e ku ev jî Erebi ji koka k-l-m yê piraştiye. Kilam, cureyekê ji muzîkê bêtir nêzikê gotinê ye. “(Schafers 2016:25)

Awayê hunera dengbêjiyê li her herêmê ciyawaz in. Ev yek jî ber şexsîbûna huneran e.

“Herçend di vî warî de xebatên berfireh nehatibin kirin jî em dikarin dengbêjên herêma Serhedê û yê Deştê ji hev cuda bikin. Dengbêjên Serhedê bêtir epîk in, yanî vegotina wan xurt û dirêj e. Awayê wan epîsodîk e, yanî ne ser xeteke rast diçe, veşerok e. Ew bêtir bi dengê serî/sewta qulingî dibêjin, lewma awayê hawîkirina wan dirêj in, zû nakevin û dikarin rojan bistrin. Herwiha bi piraştinê enstruman bi kar nayînin, eger enstruman hebe jî bilûr e. Dengbêjên Deştê bêtir lîrik in, yanî vegotin kurt û nerm e. Ew bêtir bi dengê qirikê dibêjin yanî dixulxulînin, lewma zû dikevin. Dengbêjên Deştê enstrumanên wekî rubab, saz û tenburê lê didin.”(Yıldırım, Pertev û Aslan, 2013: 77-78)

“Dengbêjî ew hêman e ku ne bi qeyd û nivîsên, lê ne bi hukmê gotinê herî kêr nîvê kelepor û daboriya me aniye îro û ji me re gencîneyeke dewlemend ristiye. Di wir de hukmê deng û gotinê sereke ye. Gotin bi deng ve weke av û arvan tîndîrîndî, çawa ku jê hevîr derdikeve her wisa jî kilam an jî stran derdikeve.”(Eroğlu 2015: 62)

Dengbêjî di nava kurdan de cihekî taybet digire ku hestên gel, jiyana wan, lîngêran ya cihanî dide nîşandan. Di nav kurdan de fonksiyona bîra çandê dibênin. Xem, xemgînî, keyfxweşî, dilşadî... Hestên niştîman ê cur bi cur bi kilamên dengbêjan ê efsûnî bi sedan sala hatiye vegotin. Lewra bi saya dengbêjan buyerên giring di hişê mirovan de mane û dengbêjên din bi şagirtên xwe re ev çand meşandine û mîna sîrkûlasyonekê ev tevger domandine. “Dengbêjî, ji kurdan re bûye pênuş, kilamên wan bûne lîngêsk û bê rawest tim û tim, bi sedan salan qedera Kurdan a kambax, ji cîhanê re vegotîne.” (Öner 2015: 38)

Bi saya dengbêjan haya gelê kurd dîroka xwe hebû ye û paşeroja xwe, kirinên kal û bavên xwe jibîr nekiriye. Dengbêj ger hogir û egîdan ger jî evîn û hesretan ji xwe re kiriye mijar. Destanên wek Kela Dimdimê, Zembilfiroş, Mem û Zîn, Edûlê hwd. di hêjê hişên kurdan de zindîne. Her çiqas ev destan ser parçê Kurdistanê yê ji hev cûda qawîmî be jî bi dengbêjan ev destan gihastinê tevî Kurdan. Kurdên Îranê çawa Mem û Zînê baş bizanin Kurdên bakur jî Kela Dimdimê baş dizanin. Em bi vî tespîtê dibênin ku dengbêj, Kurdan di cihekê hevpar de tîne berhev û bi hestên hevpar yekbûna Kurdan, coş û kelecane netewperwerî bêtir biqewet dibe. Fonksiyonên dengbêjan ne ev tîne nin helbet.

”Kilam û stranên me hene. Bila Xwedê wan star bike. Lewra ew stara li ser çanda me ne. Di germê de siya çinarê, di berfê de agirê sobeya êvarê ne, li Deştê Herranê û Berriya Mêrdînê av, li zivistana serhedê tav in. ... Rûpelên zêrîn derdixin ber çavan ji nav pêlên dîrokî yê toz û gemar girtî. Nahêlin ku pûç û rizî bibe mêjîyê mirovahiyê. Bi pêlên heqîqetê, dîroka zordestan a şaş berevajî dikin. Cewherên bêmîsal derdixin ji nav lepên qirêj ê kedxwaran. Rastiyan li nav çavên avakarê wê dîroka mêjîxwar dixin. Ew avakarên ku qaşo zanyar in. Kilam û stranên me, destanên tekoşîna hebûna me dinexşînin li ser hiş û mêjîyê me.” (Amed, 2013: 92-94)

Di çanda Kurdî ya devkî de gelek dengbêj û kilam hene. Ji wan hinek tîndîrîndî hinek jî nayîn nasîn. Dengbêj û kilamên navdar bi bîreke kolektîf heya îro hatin. Di xaka mezin a Kurdistanê de gelek gund û cih hene ku di li van deran de hunermendên pir baş hebin jî heya

gelek gelê Kurd ji nîne. Sedema vî yekê jî tinebûna amûrên tomarkirinê, redyo, televîzyon, medyaya civaki ye. Teknolojî berevajiyê Ewropayê dereng hat li Rojhilata Navîn û di heman demê de li Kurdistanê. Lewra gelek dengbêj û kilam nehatin nasîn û jibîr ve çûn.

Dêngbêjên navdar; “Evdalê Zeynikê, Gulêya Fileh, Ferzê Mistefayê, Xelê Heyran, Feqyê Qizqapanê, Emerê Zeynikê, Mihemedê Zibêd, Peroyê Têxûtê, Zibêdê Qirka, Mistefeyê Çiftborî, Şeroyê Bîro, Hecî Sêvdînê Remedana, Soska Simo, Zibêdê Emo, Kazoyê Garisya, Mihemedê Canşa, Evdilrehmanê Milazgirê, Zahîro, Sadiqoyê Qirimqayê, Sidîqo, Mexsûdê Hemzika, Kawîs Mîlanî, Ebdulkerimê Panosê, Fegiyê Şêwranşêxê, Filîtê Axtepê.” (Ulugana sedat, Kürt Tarihi dergisi, hj26,rp43 2016, stenbol) ji xeynên van dengbêjên wekê: Şakiro, Miradê Kinê, Kawis Axa, Keremê Kor, Cewer Axa, Reso, Ayşe Şan, Meryem Xan, Tehsîn Taha, Îsa Berwarî, Karapetê Xaço, Kazo, Dayikê Xiro jî navdarên dengbêjan in.

“Cegerxwîn, dengbêjan kedkarên zimanê Kurdî hesab dike û wiha dibêje: dengbêj û stranbêj bi hunera xwe wenda bûna li zimanê Kurdî re bûne asteng. Ew kedkarên zimanê Kurdî ne; bi xebatên xwe zindî bûna di ziman û çanda Kurdî de xwedêyê pareke mezin in.” (Yıldırım, 2015: 330)

Dengbêjî hûnereke taybet dixwaze lewra hemû kes nikare bibe dengbêj. Ji bo dengbêjî ne bi tinê deng ne jî hişkî jîr bes e. Dengbêj, hem xwedê dengê xweş hem jî hişke bêsînor û jîr in ku buyerên beriya hezar salan di hîşên xwe de digirin û bi dengên xwe yê efsûnî wan ji nifşên pêşende re vediguhêzin.

“Edebiyata devki xwediyê stîl û estetîkeke taybetî ye. Ji ber vê jî, her dengbêj û çîrokbêj ne dengbêj û çîrokbêjekê baş û hosta ye. Ji bo ku mirov bikaribe bibe dengbêjekî baş û hoste, divê mirov baş qayidê, edet û ûsilên dengbêjiyê bizanibe û li gora xwe stîl û awazake taybetî bîne pê. Eger dengbêj ne xwediyê van yekan be, ew nikare bibe domdarê dengbêjiyê, nikare stran û gotinên nû yên buyerên nû biafirîne û li gora xwe ‘ecoleke’ ava bike. Navdariya dengbêjên bi nav û deng ji zanîn, hostetî û hunermandiya wan tê.”(Uzun, 2003: 31)

Dengêjî di jiyana civakî de roleke giring dilîze ku di demên berî de wekê niha televîzyon, telefon, civaka medyayê hwd. tine bû. di şevên dirêj de mirov dihatin ba hev û guhên xwe didana dengbêjan. Dengbêj ji wan re kilaman digot nifşa wê demê û nifşa beriyê re dibû pîrek. Bi vê peywendê mirovan, bêtir mirovên xwendinê nizanin re cih û cih dibû mamosteyek ku ji vî mamosteyî meseleyên dîrokî hîn dibûna.

Naverok û mijarên kilaman bi rewşa kurdan, serpêhatiya wan jî diguhire. Dema serhildana agiriyê qewimê Dengbêj Reso li ser vê serhildanê kilama we ya bi navê "Weylo Weylo", Seyîtxan, Xalid Begê Cibrî gotiye û beste kiriye. (Ulugana, 2016: 40-43)

Têgiha koçberî û mişaxtî jî disa van salên nu da piştê serhildan, vala kirina gundan di kilaman de cih digire. Rohat Alakom di pirtûka xwe ya "*Di Folklorê Kurdî de Serdestiyeke Jinan*" de di beşa pencê de "qambaxa vê sîrgûnê 'di folklorê kurdî de stranên xerîbîyê' behsa vî mijarê dike : "Ew kesên ku koçberî welatên xerib bûn û xwe avêtin ber bextê van dewletan, bi dirêjaya salan li wir man. Li van welatên ewropî çend peyvên latînî yên mayin ketin nav zimanê Kurdî li welatên dereke wek peyvên deportation(sîrgûn), migration(koçberî), diaspora(belavbûn), exil(xeribî), getto(ta-xa xerîban), asyl, asylum, azly(starbûn)...serpêhatî, macera, enînivîs û dîroka Kurdan, hertim ferhenga xerîbiyê 'dewlemend' kiriye. Çawa xuya dibe babeteke balkêş e." di heman beşê de nivîskar wiha dibomîne : "Mirov xwe di دنیا çîrokan de dibîne, wek li welatê hat-nehatê. Carîna çûyîn heye, lê belê hatin tune ye. Tecrûbeyên Kurdan ên sedsalan ev yeka baş nîşan dane. Gelek kes li xerîbiyê nexweş ketine, di şeran de mirine, qezayek hatiye serê wan û li wan welatên xerîb mirine. Ew xeberên reş gelek caran bûne babetên stranên xerîbiyê û hin caran jî nêzîkî stranên şînê dibin. Ji ber ku destên dildar, dilketî û hezkiriyên di bercên xerîbiyê de dikarin bigihîjin hev, ew dûrîdest in, bi gotineke din ew bi dest nakevin. Di zimanê Kurdî de tu peyv kasî peyva *dûrîdest* maceraya didaran û hezkiriyên li xerîbiyê nikare tarîf bike û bîne ziman. Peyva *dûrîdest* bi rastî peyveke gelek şîrîn, romantîk, kurt û manekûr e." (Alakom, 2009: 148-149)

1.2. MIJARÊ KILAMÊN DENGBÊJAN

Çiqas dîrok û çanda Kurdan ji aliyê buyerên serhildan, şer, pekrewaniyê dewlemed be ewqas ji aliyê zilm û zordarî, mişextî, evînên bêçare û qirçirîna jî dewlemend e. Ew dewlemendî ji mijarên kilaman ve dengbêjan re bûye çavkaniyeke berfireh. Ku dem tê dengbêj li ser hogir û pekrewanekî dem tê li ser şerekê an jî li ser evîna xwe distire. Hestên xwe bi kilaman tene zimên. Bi gelemperî mijar û kilamen dengbêjan ev in:

Dîlok: Di rojên keyfxweşiyê, mihîrcan, pîrozbahî û dawetan de dengbêj wan kilaman distirin. Dema dengbêj kilamên xwe bi enstrûmaneke bibêje govend û reks jî tene kirin. Dîlokên Miradê Kinê navdar in.

Minak:

Heyatê

Hey...hey...

Navê keçikê Heyatê

Şêrînê awir şewatê

Min sund xwarî bî

Qur'anê, bi incilê bi tewratê

Heta saxbim li heyatê lê

Lawik terka te nadê

Lawik terka te nadê

Heta bi pir a selatê

Her du çav ê min hafî

Destê xwe bi destê min de

Rabe em herin midyadê

Hey.. heeeeeey.

Çavê wê xêmalî ne

Birhê wê qeytanîne

Çavê xwe digerînim lo

Yek e weka te nîne

Nexweş im li ser livîna

Lê hal û wextê min nîne

Heta bş enqere çûme

Heta bi edene çûme

Heta bi antalya çûme

Heta bi istenbolê çûme

Li cem textora derman nîne

Lawiko li bextê tema

Ezê qopça singê vekim

Her du memka bibîna

Weke hêk û hirmî ne

Weke petixê Mehî ne

Ji min û xwe re bişkîne

Nesîbê min û kî ne

Ramusanek bidim te
Havînê êş e li te nîne

Lawikê Siwaran: Kilamên mêrxasî, egîdî, xweşmêri ye. Coşdarî tê gotin. Dişibe destan an. Kela Dimdimê, Şekir Axa, Silemanê Mistê hinek ji van kilaman in.

Minak:

“Dayê dayê dayê

Lê dayê

Hacê digotî lê lê Huco Ferîdo gulî berî rabe şereka li me çêbu qalekî li me qewimî

Li ser hêsirê geliyê zîlan li warê sara li çemê sûdê kaniya dîdo li delavê êriş wê

Ez nizanim gelo sebebê vî şerê hanê gelo kê û kê û kê ye

Heyran nizanim sebebê vî şerê hanê kê û kê û bira kula xwedê bi kul be

Bikime derê doqûzûncî alayê firqa aliyê Bazîdê Derwêş Begê Mihamedê Hesê Hecî

Elî Şêx Zahir xelqê sarê sûyê

Ro li ber ava bu gelo di heqê hêsirê geliyê zîlan da gelo gidino ca îxbarî kiri ye

Heyran tu bala xwe bidê Dewrêş Beg agirê kula li mala xwe kir hezar u pencsed

nifûsa geliya zîlan di kutukê da derbas dikir heyfa min nayê li birina mala Şêro bavê

Mizefer

Gula xorta E'fê delali Êsif Begê heyfa min li wê yekê gelo ji bona gustila zêr

Dû heb cendirme mifreze gelo tiliya Êsif Begê bi qesatûrê ber da jêkir û jêkir eman

ax ayy

Ezê di heqê kîjan eşirê da bêjim hêê

Sîrê sîrê sîrê

Ezê sîra bavê Mizefer gula xorta me he emaaann

Le Hacê digotî lê lê Huco Ferido gulî berê

Rabe şereka li me çê bû qalekî li me qewimî li ser hêsirê Geliyê Zîlan li warê Salih

Li çemê sûdê li kaniya dîdo li delavê êrişoyeê ji gavê dima

Şer giran e gelo li orta her du riya ne eman

Heyran gelo şer giran e li orta her du riyân

Bira kula xwedê bi kul be gelo ket doqûzûncî alayê li firqa aliyê Bazîdê Dewrêş Begê

Mihemedê Hesê Hecî Elî Şêx Zahir xelqê siwarê sû yê

Ro li ber ava bu devê top û tivinga gelo li hêsrê Geliya Zîlan girêdane

Dewrêş Begê agirê kulê li mala xwe geliyê Zîlan da kirî qesabxane

Şûrê li ber qiriqa zarê li ser qeman û singûya ne xwîn dikişîyan mînanî misra çeman

û kaniya ne

Kê digo Hacê Huco Ferido her se gulî bir gelo bir a bîne

Cendeka ava sar dibinî gelo ji bona derd û kulan e eman eman ax ayy

Ezê di heqê kîjan eşirê da bêjim hêê

Sîrê sîrê sîrê

Ezê sîra bavê Mizefer gula xorta me gelo hê hê

hê”

Payîzok: Dengbêj, dawî bûna havîn û biharê ji xwe re dike xem. Lewra di Kurdistanê de payîz, seretayê sermayê, şevên dirêj e. Bi van kilaman dengbêj ne tunê hestên xwe yên gelê xwe jî têne ser zimên.

Heyranok: Heyran jî tê gotin. Kilamên hezkirin û evîniye. Dengbêj û dildara wî/ê carinan bi hev re kilamên evîniyê dibêjin. Dengbêj, çirokên gelêriyên evînê bi ezgiyêke kilaman distirin: Siyamend û Xece, Mem û Zîn, Zembilfiroş...

Lawij: Di van kilaman de hinek dengbêj, kilamên oliyê dibêje hinek jî dema mirovek dimire ji bo miriyê distire

Dengbêj û stranbêj têgihên ji hev cûda ne ku dengê mirovan xweş be dikarin stranan bibêjin. Minak; zarokên wek stranbêj hatine qabûlkirin jî pir in. Di dawetan de stranan dibêjin an jî bi medyaya civakî popûler dibin. Ev yek tinê ne taybetmendiya hunera kurdan e. Di nav her neteweyê de minakên ji wan hene. Disa stranbêj, straneke di hişê xwe de bigire an jî nivîs û xwendina wî/ê hebe dikare straneke hatiyê amadekirinê bixwîne. Lê dengbêjî hunereke taybetê dixwaze. Hemu kes nikare bibe dengbêj. Pêwistêke ku dengbêj buyeran di hişê xwe de baş bigire; xwediyê hafizyêke bihevbeşiyê be. Perwerdehiyêke taybet ne pêwist be jî ji zikmakî ve qabiliyê dixwaze. Dengbêj bi giştî amûrên muzîkê bikar nayînin û heke bikar bînin jî mey, ribab, erbane yê bikar tînin. Lê repertuara ensturamanên stranbêja berfirehtir e: Saz, klarnet, mey, erbane, tembûr, gîtar, qanûn, dehol, zirne...

"Di kilamê de qafiye heye lê serbest e. Mînak yek rêz 5 bêje; yên din 30 bêje. Ev jî dengbêjan re derfetekê vegotîneke berfireh dide. derfeta vegotîna buyeran bi hêsanî wekê romannivîseke dide. Ê jî bo zimanê Kurdî dengbêj çavkanî nin ku pênc caran gûh bidî sê kilamên Şeroyê Bîro hînî Kurdî bibî. Bila guhên xwe bidin Reso û Şakîroyê hingavê hînî

Kurdî bibin. Her wiha ji bo dîroka Kurdan jî giring e: Jixwenasînê, bav û kalê min kî bûn; çî kirine, wê hîn dibe mirov û ev agahî nifş binifş vediguhêze." (Hamelink 2016: 56)

1.3. DENG BÊJÎ DI SERDEMA OTONOMÎ Û MODERN DE

Gelê kurdan sedan sala bi axa, mîr û began di rewşeke ozerk, otonomî de xwe îdare kirine. Dema dewleta osmanî xwest ku dawîya otonomiya niştîmanên bindestê xwe bîne û wan merkeza xwe de berhev bike ev rewşa kurdan ên xweser jî dawî bû. Ev dawî bûn bi xwe re rewşeke neyînî ji dengbêjan re anî, lewra dema eşîrên Kurdan xweser bûn axa, begên van eşîran dengbêjan hîmaye dikir. Dixist di bin hêvişîna xwe.

“Dengbêjê herî kev ê ku em navê wî dizanin Selîm Silêman e ku di sedala 17. de jiyaye. Ew bi xwe dengbêjiya Mîr Şerefê Mîrê Xizanê kiriye. Em dizanin ku Selîm Silêman di heman demê de niviskarê berhama Zuleyxayê ye jî. Dengbêjê navdar Evdalê Zeynikê dengbêjiya Sirmelî Mehmed Paşayê eşîra Mîlanê kiriye. Ehmedê Fermanê Kîkî li cem Reşid Begê Kîkî demeke dirêj dengbêjiya eşîra Kîkan kiriye. Her wiha Karapetê Xaço ku bi eslê xwe ermen e, wî jî li cem Filitê Quto dengbêjiyan eşîra Reşkotan kiriye.”(Yıldırım, Pertev û Aslan, 2013: 79)

Em dikarin bibêjin dengbêjekê her axa, beg, mîr hebû. Di mala van desthilatdaran de odayên teybet hebûn. Dengbêjan hunerên xwe di van odayên taybet ên bi navê dîwanxane de bi cih dianîn. Şevên bi navê şevbihurikê, welatiyan di diwanxaneyan de guhên xwe didina dengbêjan. Dora şevbuhirkê li kîjan malê be dengbêj jî diçû li wî malê. Dengbêj, bi dengên xwe yê xweş, meth û pesnên begên xwe dikir. *Dixwazîn pesnên “patronê” xwe bidin. Lê car caran rexneyan jî dikin* (Tekîn, 2015: 119)

“*Dengbêjekî baş, ji axa yan ji begekî dewlemend û xwedî îmkan bêtir navdar û bi rumet e.*”(Uzun 2003: 30)

Qedr û rûmeta dengbêjan di nav gel de jî pir hebû. Lewra axa, beg, mîr ev hunermendên hêja himaye dikirin. Dîsa dengbêj jî bi piştgiriya van desthilatdaran bêtir xwediyê qîmet dibû. Rewşa wan ya aborî jî bi saya wan baş dibû û tinê bi dengbêjiyê mijûl dibûn ku bal û hişyariya wan bêtir ser hunera wan bû.

Kengî axa, beg û mîrên kurdan li hemberê dewleta osmanî têk çû hingê dengbêj jî mane bêxwedî. Ji aliyê aborî û xwediya gelek zehmet kîşandin.

Dema ku xwediya dengbêjan hebûne, dengbêjî jî pêş ketiye; gelek dengbêj gihane. Kîngê ku desthilatiya kurdan li welatê wan qels bûye, dengbêj jî bê xwedî mane. Gelek dengbêj ji ber xizaniyê neçar mane ku dev ji karê dengbêjiyê berdin. Evdalê Zeynikê (1800?-1913), Eyşe Şan (1938-1996) (Yaş, Akyol, 2009) û Şakiro (1939-1996) (Öztürk, 2014) çend mînakên nêzîk in. Ev dengbêj di kilamên xwe de bi awayekî eşkere behsa bêkesî û xizaniyê dikin (Tekin 2015: 119-120)

“Piştî têkçûna piştevan, dengbêj êdî firoşê malekî ye! Ev veguherîn bi xwe re çi tîne? Bi xwe re xerabûna epîkê tîne. Ji ber ku dengbêj ji diwanxaneyê dadikeve ciyê dîlan û şahiyên, ji parastineke feodalî jî mehrûm dibe. Erê, rûmeta wî ya civakî diheje û karîzmaya wî sivik dibe! Ev hal, di straneke Evdalê Zeynikê de gelek xweş krîstalîze dibe:

“ Ez ê Evdal im, Evdalê Zeynikê bûm

Bavê Temo, siwarê Nijdî bûm

Dengbêjê oda Sirmelî Memed Paşa [ê] teyrê dewletê bûm

Dilê qîz û bûkên xelkê di min de hebûn

Berdevkê mîr û hakimî, çawîşê xortan bûm

Roja îro kor bûme çavê min nabînin

Mame li ber hêt û dîwarên xelkê

Bûme pêkenokê qîz û bûkên Zîlan û Heyderan

Li min wayê, li min wayê!...” (Alan, 2015: 13)

1.3.1. MALA DENGBÊJAN

Dengbêj, berî hunerên xwe di diwanxaneyan, qadên dawet û şînan, gundan, qehwexaneyan, konê zozanan îcra dikirin. Lê ev sedsala 21'ê weke sedsala zanistî û teknolojiyê tê binavkirin. Ev serdem bi xwe re rehetiya gihiştina tiştan jî anî lewra dema mirov bixwazin bi tv, radyo, teyp, internetê û hwd. dikarin gûhên xwe bidin kilam anj î stranan. Gelek dengbêjên serdama modern, bi radyoya êrîvanê anjî bi qesed, CD û tv'yan dengê xwe, kilamên xwe ji gihandin li gel re û ev çand roj bi roj didome jî. Lê wek pêşwendî û başiya teknolojiyê zerer û nebaşiya wê jî heye. Di çanda dengbêjiyê ya berî de dengbêj û gel dorhêleke hevpar dihatin ba hev. Gelek caran dengbêj devjenî dikirin û hawirdeke bihûner, bicivakî û bikeyfxweşî derdikete holê. “*dengbêjên navdar ên her parçeyî û her dewrê hene. Ev dengbêj hem ‘traditionekê’ didomînin û hem jî bi xwe bi navê xwe ‘ecole’ ava dikin*” (m.uzun antolojiya edeb. kurdi rp31)

Ji bo ev çanda dengbêjiyê dawî nebe û bidome *Mala Dengbêjan* ji aliyê hinek şaredariyan, komeleyan ve bi armanca parastina hunera dengbêjî û veguhastina vê hunerê ji

bo nifşên dahatû re hatiye vekirin. Di heman demê de niha bajarên Agirî, Amed, Cizîr, Mûş û Wanê *Mala Dengbêjan* heye. Yê herî navdar ya Amedi ye.

Avahiya ku wekî Mala Dengbêjan tê bikaranîn, maleke kevn a Amedê ye û ji 100 salan kevntir e. Li wê malê du odeyên mezin û hewşa wê ji hêla Mala Dengbêjan ve tîkî bikaranîn. Ji ber ku havînê hewa germ e, dengbêj hewşa malê ya hênîk bi kar tînin. Her roj li dora 10-15 dengbêj tîne serdana Mala Dengbêjan û dengbêjiyê dikin. Lê di demên taybet ên wekî festîvalan de ev hejmar dibe 30 û carnan jî zêdetir.¹

“Dengbêjî, di nav civaka kurdan de wek formeke veguhastinê cihekî sereke digire û îro jî hêla kurdan ve bêhtir wek formeke 'netewî' tê nirxandin. Dengbêj kî ye? Çi dike? Dengbêj ew kes e ku bi dengê xwe rih û can dide serpehatiyên berê, û wan serpehatiyên careke din bi dengê xwe -û carinan jî bi alîkariya bilûra xwe- di hafizeya çandî ya gel de zindî dike. Ji vê yekê jî tê xuyakirin ku ev wek bardên Keltan an jî griotên Efrîkayê barkêşên hafizeya çandî yê di nav kurdan de ne. Bêguman di nav folklorê kurdan de ne tenê dengbêjî lê hinek formên din ên veguhastinê, an jî vegotinê hene, lê wek li jor jî hat gotin van salên dawî wek formeke 'netewî' tîkî nirxandin. Vekirina 'malên dengbêjan' li Diyarbekirê ji hêla Şaredariya Mezin ya Bajêr jî vê yekê dide xuyakirin”(Keskin, 2016: 51)

1.4. DI ÇANDA DENBÊJÎYÊ DE ROLA JINAN

Kurdan êş, jan û xemên xwe ji kilamên xwe re kirine mijar. Bi kilaman hestên xwe vegotine. Ev vegotin ne vegotineke ketûber e. Gelek mirov hene bêtir jî yê jin ku dema guhên xwe didin strana bi gurahiya hestên xwe nikarin xwe û digîrîn. girîneke bêdeng û kur dikin. Dema ev lêkolîn hat kirin ev buyer bal kîşand. Sedemên wê cur bi cur in. Lê di vê rewşê de bandora dengê dengbêji yê hîkarîker berbiçav e. Bi vê yekê re bandora serborî û jiyînê mirovan jî hene. Jin bi afirîşa xwe mirovên bihest, dilzîz û dilhelûk in. Lewra hestên xwe bi kilam, lorîk, şîn hwd. anîne zimên. Derd û kulên di dilên xwe de bi vê awayê kêmtir dikin.

Li herêma Berwariya Botan dema ku ev lêkolîn hat kirin kesên ku wan re hevpeyvîn hat kirin navê hinek dengbêjên jinan gotin. Sebîhe, Hecî Hisna ji wana ne. Herdu jî ne li vê dinyayê ne. Qesedên wan nîne ku li vê herêmê mina cihên ku giraniya islamiyatî heyê ji ber gûnehbûnê jinan ji xeynê malbata xwe û civatên jinan kilamên xwe nestirîne. Kurê Sebîhe'yê Ahmet Bîlen ji bo diya xwe wiha dibêje:

¹ <http://turizm.diyarbakir.bel.tr>.2017

“Diya min dengbêjek bû. Lê ew miroveke olperest jî bû lewra dema kesên biyaniyê mêr hebûn ew nastiriya. Ez gelek kilaman ji wê hîn bûm. Di tovê hezkirina dengbêjiya dilêmin de bi saya wê şîn bû.”

Li gorê agahiyên ji neviyê dengbêj Heso hatinê tomarkirin dotmama Heso, Hecî Hisna jî denbêjeke dengxweş e. Li pismamê xwe re heman demê jiyaye. Mêrê hecî Hisna Reşîd, ji bo biçê hecî rê ketiye. lê di rê de miriye. Ew jî ji bo mêrê xwe şîn dike û lawijan dibêje. Jinên derdorê jî bi van lawijan digîrin. Lê tu qesedê hecî Hisna tune. Ku ew jî ji ber ramanên herêmi yê ,gûnehe jin kilaman bibêjin, ê ye.

BEŞA DUYEM

DENGBÊJ HESoyÊ ŞÛXÎ

2.1. GUNDÊ ŞÛXÊ

Cihê mirov ji dayîk bûyê an jî welatê mirov li ser xisleta mirov xwediyê bandoreke mezin e. Mirov nikare xwe ji çanda xwe, gerdîş û kevneşopiya xwe razber bike û veqetîne. Di zanista derûnnasiyê de li ser vê babetê minakên berfireh hene.

Erdigarî qeder e. Ev gotina Îbn'î Haldun gelek dengdar e ku rewşa gelên weke rojhilata navîn dide fêhm kirin. Dengbêj Heso li kû ji dayîk bûye welatê wî derekê çawa ye. Bersivên van pirsan bê zanîn dê dengbêj bêtir bê naskirin

Şûxa, gundê Xesxêr e. Xesxêr jî navçeya Sêrte ye. Dûrahiya wî ji gund 65 km ye. Ev herêm, herêma Botan e. Navê Şûxa yê bi Tirkî Köprüçay e. Ji bo çi navê Şûxa yê li gund hatiye dayîn nayê zanin. Derbarê dîroka Şûxê de neviyê Ebdulmenaf weha dibêje:

“Tarixa şûxa, bapirê me kalê me ji halo ji me re qîset kiriye. Bedirxan begê Cizîrê bapirê me (Hemdî axa) bi giliha mîlet û ku gotine zilmê ji me re dike. Xaniqandiye, avîtine birca belek. Bedirxan beg (rojekê) 40 roj û 40 şêv şahiyê daniye. Du kurê (Hemdî axayê)jî hene. Rihspiyên Eruh gotine wan herdu gencan hûn neçin dê Bedirxan beg hewejî bikujîne herin sergovendê bigirin şal û şepik xwekin. Ev herdu genç jî çûne. Her dû jî xortên spehîne. Çûne sergovendê girtine. Bedirxan begê li wan nêrêye wan nasnekiriye. Ji rihspiyên xwe pirsîye gotiye ka ev herdu genç kîne? Gotine ewên te kuştîyî bavê wan asmişî birca belek kiriyî ev herdu kurên wî ne. (Beg) gotiye ma kes tine bû mûdafa wî bike. Ev zîlam ne yê kuştîne bûye. Rabûye herdu aniye lik xwe gotiye herin li Şûxa, (ji bo) xwîna babê we min daye we. Ji hingê ve Şûxa... belkî 200, 300 sal tarixa heye. Belkî zêdetir. Em ji eskî Erûh hatine. Gundê me ewwilê eskî Eruh bû yanî navê wî tirkî Bîlgîlî köyü ye. Em ji wîdî hatine.”²

Gund, heft cara bi sedemin curbicur hatiye valakirin. Herî dawî sala di 1993'yê de ji ber şera PKK û dewletê hatiye vala kirin û neh meh şûnve gundê vegeyriyane li gundê xwe.

Gund bi çar taxan ava bûye û li cihekî deştî ye. Di piştta gund de çiyayê Herekol heye. Herekol li nêzîkê vî gundê destpê dike heta Şirnex berdewam dike. Di nav çiyayên kurdan de çiyayê Herekol navdar e. Celadet Elî Bedirxan ji xwe re navê vê çiyayê kiriye bervavk.

² Hevpeyvîna ligel neviyê Ebdulmenaf (Abdulmenaf Oğuz, temen; 36), 2016 Sêrt

Di gund de goristan û dibistana seratayê heye. Nexweşxane nîne. Gundê hemû Kurd in. Cil û bergên Kurdî tên vegirtin.

Florayê gund bal dikişîne ku ji aliyê kulîlk, giya we cihekî pir dewlemend e. Jinên gund biharê giyayên cihê berhev dikin û bi van giyayan xwarinên cur bi cur çê dikin.

Îklîma gund bejayî ye. Zivistanan serma ye berf lê dike. Havînan germ e, bêşili ye. Şilî herî gelek biharê lê dike. Milekê çemê Botanî li vî gundê derbas dibe û bi vê cobarê gund dibe du şax. Şaxa çepê hêmî û germ e. Şaxa rastê, milê Herekolê ve ye û ev der sermatir e.

Hejmara nifûsa gund ya sala 2016'ê 578 e. Ji vê hejmarê 295 kes jin û 283 kes jî mên in. Bi qasî van jî koçên derveyî hene. Yên koçê kirinê çûne navenda Sêrt, Edene, Mêrsîn û Stenbolê. Li wir dijîn û vê derê kar dikin. Di gund de 75 mal hene.³

Rewşa guhastinê ne baş e ku riyên gund bêasfalt, bifetlanek û biax in. Ev rewş bandoreke neyinî li ser danûstendinê û hatin-çûyinê dike.

Rewşa gund ya çandinî û ajeldariyê baş e ku çandina fistikan, tiriye teyfi, sêvan tên kirin. Di van salên dawî de bi çandina fistikan gundî devlemend bûne. Têkiliya wî bi tu dezgehên sanayi nîne. Gelên gund ji xeynî çandinî û ajaldariyê bi cerdawanîyê jî jiyana xwe didomînin.

2.2. KURTE JIYANA DENG BÊJ HESOYÊ ŞÛXÊ

Da ku dengbêj baş bê zanîn di jor de derheqê gund agahî hat dayîn. Dengbêj koça dawî kiriye. Lewra dema ev lêkolîn hat kirin aloziyên cur bi cur derketin. Agahiyên li ser jiyana dengbêj, ji xwaha û neviyê wî, ji guhdarên wî hate tomarkirin.

Dengbêj Hesoyê Şûxê ji gundê Şûxa ye. navê wi ya fermî *Hasan Oğuz* e. Dîroka hatiyê dinyayê û mirina wî bikêmasî û bi awayê fermî nayê zanîn. “*Em nizanin bapîrê min kîjan tarîhê çêbûye an jî miriyê lê sala 1995ê da miriyê û dema miriyê not salên xwe da bû.*” (Hevpeyvîna ligel neviyê dengbêj Abdulmenaf Oğuz, temen; 36, 2016, Sêrt)

Li wir mezin bûye û emrê xwe tamam kiriye. Dengbêj bê dê mezin bûye. Ji dayîkê ve çavekî wî kor e. Ji ber bêbextiyekê heft mehan maye di zindanê de. Xwediyê çar keç û du kuran e. Pîreka wî rehma xwedê kiriye. Navên keçên wî Perî û Maşallah e. Herdu jî sax in. Navên kurên wî Abdurrahman, Mehmet, Abdullah û Mahmut e. Ji xeynî Mehmet hemû sax in. Sê xwişkûbira ne. Navê birayê wî Mehmed e. Ji ber ku zilamekî birîndar kiriye raviye

³ Ji bo agahiyên derbarê nifûsa gund, bnr: www.nufuse.com, 2017

Dihok'ê. Li wir zewiciye û emrê xwe xilas kiriye. Navê xwaha wî Naime Toraman e. Li Sêrtê dijî û bi wê re jî hevpeyvîn hat kirin. Ji bo birayê xwe wiha di got:

“Dengbêj Heso birê min ê helal e. Birayekî min dîjî heye ew dema ciwan bû ji ber meseleyekê revî Dihokê û ma wî dî. Ez jî zewicîm û çûme gundê Beşa. Birê min ji dengê xwe gelek hez dikir. Her caran distiriya. Em ne guneh bûn lewma ji bo qezencê nastiriya. Keyfa wî ji dengê wî dihat ew jî ji xwe ra distiriya. Milet jî ji wî gelek hez dikir.”

Dengbêj, perwerdehiya xwe li hostayên dengbêjan ê wê demê Îsayê Qutî girtiye. Di derheqê vî dengbêjê de agahiyên tê zanîn ev e ku dengbêjekî hosta ye. Ji gundê Beşa ye. Dengbêj Heso, 40 şeva penç kilometre rê ji bo perwerdehiya dengbêjiyê diçe li ba Îsayê Qutiyî. Li wir teknîkên dengbêjiyê hîn dibe û xwe pêşve dibe. Sibehan jî karên xwe yên malê û çandinê hwd. kiriye. Wekî dengbêjên herêmê bêamûr hunerên xwe Îcra kiriye. Destê xwe daye ber guhê xwe û kilamên xwe ji guhdarên xwe re gotiye. Dengbêj, kilaman ji ber kiriye û di hişê xwe de girtiye. Ji bo hezkirina kilaman û dengê xwe yê xweş hunera xwe icra kiriye. Ji vî karê tu pereyan kar nekiriye. Qesetan dernexistiye û beşdarê tu bernameyan nebûye. Civateke mezin guhdarvanê wî bûn. Guhdarvanê dengbêj, dengê wî tomar kirine û qesetên wî firotine. Hêjê gelek malan qesetên dengbêj Hesoyê Şûxê hene.

Karê wî yê herî mezin dengbêjê bû. Her demê distiriya. Demên xwe gund bi gund bi gerinê derbas dikir. Li van gundan gundiyan erzax, run hwd. dane wî. Li ba tu beg û axayan dengbêjî nekiriye. Lê dema car carina diçû mala axayekî jî ji bo civatê distiriya. Bi malên bavê wî ji wî re hiliştî û karên cotkari yê piçûk xwe xwedê kiriye û kurên wî jî alîkariya wî kirine. Dengbêj piştê heftêh salê xwe dev ji dengbêjiyê berdaye û bi karên axê re mijûl bûye.

2.3. DU MÎNAK JI KILAMÊN DENGBÊJ HESoyê ŞÛXÊ

Dengbêj ger kilamên herêmê ger jî kilamên di nav kurden de gotiye. Mijarên kilamên wî cur bi cur in: dîrokî, evînî, şînî... Navên hinek kilamên dengbêj ê min destxistiyê: “*Sînem, Meryem, Kurê Melê, Miheme Elî û Hesenê Bira, Kilama Xazî*” ye. Bêtir li ser şînê straye ku berê di nav kurden de şer û teşqeke kêr nabûye. Ser sedemên gelek biçûk malbat an jî eşîrên kurdan şer û xwînê ji hev dûr neêxistine.

“Kilamên dengbêjan yên şînê, bîra civakê saz dikin. Helbet ev sazkirin bi rêyeke estetîk pêk tê. Dengbêj bi kilamên xwe dibin berdevkê êş û azarên ku di demên berê de hatine jiyîn. Serpêhatiyên şexsan dikin malê gel û bi vî rengî têkiliya nifşên nû û yên kevin saz dikin. Dikilamên şînê de wate û huner di nava hevsengiyekê (denge) de ne. Di çanda kurdî ya devkî de, bi taybetî jî kilamên dengbêjan yên şer û şînan de şopên dîroka kurdan ya nêzik hene.

Lewma jî divê em bidin ser şopa kilaman. Her kilamek rê li ber niqaşa dîroka fermî ku li me hatiye ferzkirin vedike. Divê em hîmê çand û dîroka gelê xwe ya nêzik li ser van kilaman deynin. Ew kilaman dikarin hest û ramanên ku pêşiyên me hîs dikirin b ime bidin fêmkirin. Herweha ew kilam dikarin rê li ber pişaftina çand, ziman û muzîka kurdî bigrin. Ji bo vê yekê jî divê kilamên kurdî ji aliyê kurdan ve bêyî ku bêne guhertin werin tomarkirin. Li ser van deng û kilamên tomarkirî divê xebatên akademîk bêne pêşxistin. Divê di zanîngehan de derfeta lêkolînên muzîka kurdî bêne sazkin. Yan na piştî ku dengbêj bimire ê deng û reng jî tevî çand û dîrokê bi wî re bimirin.” (Çiftçi 2016: 9)

Kilamên dengbêj bi xwe gotê ber fireh di pêvekê de heye. Ji van du liban min di vê lêkolînê nîşanê da. Ev her du kilam kilamên Kurdî Êzîdiya ne. Şer û şîn di nav van kilaman de jî heye.

2.3.1. Şerê Miheme Elî û Hesenê Bira

Bilbilê ji min ra bêne
Ez dirênim talanê jê rê tê dilezîne
Ezê lê dirênim ev talanê kî ye ?
Heso ji Miheme Elî birayê ra dûrbîn anî
Dûrbînê lê dinêre talanê Misto Quto ye
Miheme Elî ra dibêje: Tê mêrekê dest hilêne
Emê îro şer bikin
Vêca birê wî dibêje:
Em kêrî şer nayîn
Zarokê me biçûk in
Xulam kurê xelkê ne.
Ewlehiya me ji wan nayê
Wesiyeta bapîrê me ye
Şerê giran ji me nayê
Roja pêşemê ti car şer ji me nayê
Du zilam ti car bi hember
bist û pênc zilama nayê
Miheme Elî ba dike Heso:
Îro dengê te min nayê.
Dibêje: Mala te xirab bibe

Ê xelk koşk diwana da rûnê
Û ji hevra bibêjin:
Wan talan berê mala wan ra borî
Çik mêranê ji wan nayê
Çawa ez û tu ne sax l' ser dinyayê
Ey bira we lawo
Miheme Elî ba dikir:
Xulamê hûnê sîsemê ji me re bîne.
Xwe berda devê malê l'i ber malê ber caadê
Miheme Elî ji Misto Quto ra dibêjê:
Tikesê ti wext nedît
Xelk talan bênê
Derê mala me ra biborînê.
Misto Quto Miheme Elî ra dibêjê:
Gîskê we vê talanê da tunîn
Hûn çî ji xwe re nasekînin.
Miheme Elî dibêje:
Hûn bêkuştina min û Hesoyê bira,
Vî talanê derê mala me ra naborînin.
Dibêje şerê kurê bavan û fêrisan e.
Heso kuzika johrê ba dike Miheme Elî
Dibêje: Ezîzê mala bavê min
Tu îro nav û dengê xwe nayînî.
Miheme Elî dibêje:
Min roja ewilî jî got,
Şerê giran me nayê,
Min roja ewilî jî got,
Min roja ewilî xulam kurên xelkê ne.
Ewlehiya me li wan nayê
Wesiyeta bav û bapîrê me ye
Roja pêşemê şerê giran ji me nayê
Îro fîrsed çûye cem rebbî alem hêdî nayê
Kalik îro vê sêsemê ra maye asê
Ez kir nakim jêr dernayê

Vê sibehî gulekî min dane
Ezê birîndarim bira
Keko ez birîndarim kew li nayê.
Heso dibêjê: Ezê piştê bira
Nemînim dinyayê, wehê wehê!
Fatê digo: Eyşê bira
Sibehê mala bavê min heware
Kulên mala Hesoyê Birahîm biketa
Çûye nav Êzîdiya
Hilaniye pêncih zilama
Îloyê fileh şewqegirê
Min dît ser kuçika mala bavê min
Min çehvê xwe dît
Bîst û pênc zilam kuştin
Hey diranê lê.
Fatê digo: Eyşê rindê gulê
Birayê min çû.
Digota: Min çi zanî
Hesoyê Birahîm xencer danê
Mihemed'ê yê zavakê sê roj sê şeva
Willeh ez loma nakim
Derdê biratiyê zor e.
Min çehvê xwe dîtiye
Qetê kezebê dil û mileka
Ser serê xencerê ve hatê
Ay dêranê lê ay li min!
Ay li min ay li min!
Min Mihemed'ê yê birakê xwe
Zavayê sê roja
Min dît ser banê xaniya
Şal û şepikê Mihemed'e min dirêj e
Ketin ser gozekê
Heyfa min nayê
Heyfa ji wê heyfê

Hesoyê Birahîm Mihemed'e min,
Dide ber xencera
Ebûbekir pismam bû
Çawa l'ser leşê wî raviya
Hey diranê lê hey diranê!
Min çî got û min çî got
Heyfa min nayê,
Kuştina bîst û pênc mêran
Heyfa min tê Mihemed
Zavayê sê roje bû
Vê sibehê Heso
kuştiye Mihemedêkê min
Min çehvê xwe dît
Miheme Elî sêsema wê
Ser leşê wê hilanê
Bir danê l'ser ranê xwaha wî
Wey hê wey hê wey hê!

2.3.2. Kilama Xazî

Hey lo lo lo lo
Xazî digota: Ez Xazî me.
Xezî bi xwe me
W'ezê şerê heşînê
Tifaqa mixarê me
Di go: Mehemed bego nebêje,
Ez eşîrê pir giran im
Ez himberê te û bavê te me
Hey lo lo lo hey lo lo lo hey lo lo lo
Mîro ez himberê te û bavê te me.
Xazî digota: Ez Xazî me. Xaziyê qut im.
W'ezê şêvê berika dihelînim
Rojê w'ezê derman qut im
Mîr im nebêje eşîrim

Ez ji ber mîrê xwe nalepitim
 Hey lo lo lo hey lo lo lo hey lo lo lo
 Miho Xazî bira ne.
 Mîr im me vê sibehê
 derman vale kir l' ser pişta evane
 Miho digota Xaziyê:
 Heçî ji ber eskerê Mehemed begê biravî
 Ji min û te biçê
 Telakê jinan e.
 Hey lo lo lo hey lo lo lo hey lo lo lo
 Miho digota: Xazî bila wekê bê
 Sed car wekê bê
 Bila her demê
 Ew xeberên henê aqilê te bê
 Heçî yê ji ber
 Eskerên Mehemed begê birevê
 Vê sibehê hevalê jina xwe bê
 Hey lo lo lo hey lo lo lo hey lo lo lo
 Hevalê jina xwe be.
 Xazî ba dikira:
 Mehemed begê min û Mihoyê bira
 Sond xwariya pîrê Êzîdiya
 Xwedê em ê narevê
 Ji ber eskerê Cizeriya
 Hey lo lo lo hey lo lo lo hey lo lo lo
 Mîrê min em narevin
 Ji ber eskerên Cizeriya
 Hey lo lo lo hey lo lo lo hey lo lo lo
 Dayika Xazî digota: Konê Xaziyê min nowalê
 Belê kunê delalê min vê nowalê
 Ciwaniya Xaziyê min felitî
 Çû garanê vî sibehê
 Mehemed begê Miho kuştiye.
 Hey mala min

Konê anî ber yemanê
Hey lo lo lo hey lo lo lo hey lo lo lo
Mîrê' m konê me anîne ber yemanê
Hey lo lo lo hey lo lo lo hey lo lo lo
Dayika Xazî digota:
Konê xaziyê min vê neqavê
Hey lo konê delalê min vê neqavê
Vê sibehê Mehemed begê,
Miho û Xazî herdu kuştine
Hey mala min
Konê me hatin xezebê
Hey lo lo lo hey lo lo lo hey lo lo lo
Dayîka Xezî digota:
Mîrê' m Miho û Xazî herdu bira ne
Mîrê' m piştê filha û Êzîdiya
Malê wa yê axa, mîra ne
Tu xira neke namûsa mêra ne
Hey lo lo lo hey lo lo lo hey lo lo lo
Eger tu xira nekê namûsa mêra ne
Ehey ehey hê wa hê hê hê

ENCAM

Em nikarin dengbêj û dengbêjîtê bi tenê bi xebatekê bi vê awayê pênase bikin. Pêwist e ku ji bo vê mijarê xebatên cur bi cur û xebatên pir kûr bê kirin. Her herêmê lêkolîn bê kirin û dengbêjên nayîn nasîn bê tomar kirin. Lewra di vê serdama modern de êdî dengbêj û hunera wan wekê serdemên berî ne popûler e. Bi xabat û lêkolînan divê ev huner û hunermend bê parastin. Em dikarin bêjin ku ew baş neyîn fêhm kirin dê wêjeka devkî jî kêr bê fêhm kirin.

Têkîliya dengbêjiyê bi têgejen wek cîrokbêj, wêjeya devkî, dîrokzan, civaknas, stranbêj û hwd. re jî heye. Dengbêj bi dengê xwe yê xweş û bîra xwe ya jîr di civaka Kurdan de gelek peywirên giring girtiye ser xwe. Dem hatiye ziman û hebûna Kurdan di çar parçayê welêt de hatiye înkâr kirin. Çand, ziman, wêje di derheqê Kurdîtî de çî hebê hatiye qedexê kirin. Bi rola dengbêjan ê giring gelî Kurd ziman, dîrok û hêviya paşerojê ji bîr nekiriye. Lewra divê têkariyê dengbêjan ê siyasî, civakî, edebî tu carê neyê jibîr kir


Dengbêj Heso jî yek ji van dengbêjan e. Lê ji xeynî herêma xwe gelekê nayî nasîn. Ji kilamên wî gotiyê gelek kes agahdar e. Bi vê xebatê me herwiha cih da giringiya dengbêj û dengbêjiyê û herwiha jî cih da kurte jiyan û kilamên dengbêj Hesoyê Şûxê.

ÇAVKANÎ

- Yıldırım, K., Pertev, R. û Aslan, M. (2013). Ji Destpêkê Heta Niha Folklorê Kurdî. Mardin: Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiyede Yaşayan Diller Enstitüsü Yayınları
- Uzun, M. (2008). Dengbêjlerim. (Çepa 3.). İstanbul: İthaki Yayınları
- Alan, R. (2015). Dengbêj(î) û Helbesta Gelêrî. Kovara Wêje û Rexne. 4, r.9
- Schafers, M. (2016). Kadın Dengbêjler, Acının İşlenişi ve Kürt Tarihi. Kovara Kürt Tarihi. 26, r.25
- Eroğlu, Y. (2015). Dengbêj û Xemilandina Wêjeyê. Kovara Nubihar, 133, r62
- Öner, N. (2015). Dengbêjî û Çiya. Kovara Nubihar, 133, r.38
- Amed, A. (2013). Stran, Stara Çanda Me ne, Kovara Nubihar, 124, r.92- 94
- Yıldırım, K. (2015). Kürt Tarihi ve Coğrafyası 1 ROJAVA. İstanbul: Weşanên Şemal
- Uzun, M. (2003). Antolojiya Edebiyata Kurdî. Stenbol: Weşanên Aram
- Ulugana, S. (2016). Dengbêjler Şahî Reso. Kovara Kürt Tarihi, 26, 40-43)
- Alakom, R. (2009). Di Folklorê Kurdî de Serdestiyê Jinan. Stenbol: Weşanên Avesta
- Hamelink, W. (2016). Evdalê Zeynikê'nin Peşinde Bir Ömür: Ahmet Aras. Kovara Kürt Tarihi, 26, r.56
- Alan, R. (2015). Dengbêj(î) û Helbesta Gelêrî. Kovara Wêje û Rexne. 4, r.13
- Çiftçi, T. (2015). Di Çarçoveya Çanda Devkî De Di Nav Civaka Kurdan De Dengbêj û Saziya Dengbêjiyê. International Journal of Kurdish Studies, 1/1, r.119-120)
- Keskin, N. (2016). Di Çarçoveya Teoriya Performansê de Nirxandina Vegotinên Gelêrî. International Journal of Kurdish Studies, 2, r.51
- Çirtçi, Tekin (2016). Di Çarçoveya Bîra Civakî Ya Kurdan De Têkiliya Dîroka Nêzîk û Kilamên Dengbêjan. International Journal of Kurdish Studies, 2, r.9
- Pariltı A.(2006). Dengbêjler- Sözü'n Yazgısı. İstanbul: İthaki Yayınları

PÊVEK

1)WÊNE:



Wêne 1) Dengbêj Heso



Wêne 2) Gora dengbêj Heso



Wêne 3) Gundê dengbêj Şûxa

Pêvek 2)CD

T.C.

Mardin Artuklu Üniversitesi

Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü

Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı

Tezsiz Yüksek Lisans Bitirme Projesi

DENGBÊJLİK VE DENBÊJ HESoyÊ ŞÛXÊ

Dilek BİLEN

15721100

Danışman

Yard. Doç. Dr. Necat KESKİN

Mardin 2018



T.C.

Mardin Artuklu Üniversitesi

Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü

Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı

Tezsiz Yüksek Lisans Bitirme Projesi

DENGBÊJLİK VE DENBÊJ HESoyÊ ŞÛXÊ

Dilek BİLEN

15721100

Danışman

Yard. Doç. Dr. Necat KESKİN

Mardin 2018